

Ahenga roja cîhanî ya jinê li Dêrika Hemko

Rîbortac:NûşînBêcirmanî

Di roja cejna cîhanî ya jinê de, rêxistina pîrekê ya Partiya Yekîtiya ya Demoqrata Kurd li Sûriyê (YEKÎTÎ), li Dêrika Hemko ahengek li darxist û hin rêxistin û girûp beşdar bûn, ji wan:

-Girûpa Dêrikê ya çanda Kurd.

-Baxên jinên Dêrikê.

-Tevna Çand û Hunera Kurd li Dêrikê.

-Dad û Maf.

-Nûnerên partiyên Kurd li Dêrikê.

-Malbatên herdu pakrewanên Dêrikê.

Ahengê bi rawestaneke li ser giyanê pakrewanên Kurd û Kurdistanê dest pêkir. Paşê gotina P.Y.D.K.S. (YEKÎTÎ) ji bal hevalemê ve hate xwendin. Di pey re, ev gotin hatin pêşkêşkirin:

1-Gotina Partiya Çep ê Kurd ji bal endamê komîta rêzanî **Mehmûd Sefo** ve hate xwendin.

2-Gotina Tevna Çand û Hunera Kurd li Dêrika Hemko ji bal birêz **Narîn Omer** ve hate xwendin. Ew li ser cejna pîrekê û dîroka vê cejnê rawestiya, û herweha wê helbesta bi navê (Himbêza Pira Bafid) diyarî şevê kir, ya ku tê de dibêje :

Di himbêza pira bafid Te çû

xewnek belek danî

Li seqlanê te kon raxist

Veda dîlan bi botanî

Keçên dilsoz, ciwanên pak

Bihîstin wan civîn danî.

3-Gotna Dad û Maf ji bal evokat Ednan Çaço ve hate xwendin.

4-Helbestek ji bal rêxistina pîrekê ya Partiya Dimoqrata Kurd li Sûriyê (elpartî) hate pêşkêşkirin.

5-Birûskek ji Girûpa Dêrikê ya Çanda Kurd gihişte şevê.

6-Helbestek ji bal **Asya Xelîl** ve bi zimanê erebî hate xwendin.

Piştê, koma Dêrika Hemko ya Folklorî bi hin çalakîyan rabû. Ji wan şanoya (QOÇO), û hin stranên xweş bi dengê hunermendê hêja **Îsam Ebbas** diyarî mêvanên xwe kir,

Li dawiyê, du jinên helbestvan û yeke xebatkar hatin xelatkirin ew jî ev bûn:

a-Narîn Omer (helbestvan)

b-Asya Xelîl (helbestvan)

c- Rehîma Osman Diya Azad

Piştî xelatkirinê, nûnerê Newrozê, herdu helbestvan dîtin , ev kurte hevpeyvîn bi wan re kir, û ev herdu pirsên han ji wan kirin,

1-Tu vê şevê çawa dinexînî?

2-Gotina te ji weşana Newroz re çiye?.

PÎROZ BE

Cejna Çarşema Sor, bi navê din 'Çarşema serê Nîsan ê' li gorî bîr û beweriyên civaka me, roja afirîna cîhanê, peydabûna xêr û bereketa axê ye. Çarşema Sor roja destpêka aşî û aramiyê ye. Xweza reng diguhere di wê rojê de.

Çarşema Sor, cejna civaka Êzdî ya herî mezin û watedare ku ji dîroka kevin ve wek Sersala Kurdî tê pîrozkirin.

Çarşema Sor, ji bo tevayîya gelê kurd çand, ziman û dîrok bi xwe ye. Ev cejin, nîrxekî gelê kurd e. Parastin û pîrozkirin ji mafê her kurdekî ye.